Ronahî
şopdara rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar: 485 9- Mijdar - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Em hê jî di banê wan de dijîn



**Di sala 1915'an de dewleta Osmanî bi sedhezaran Ermenî qetil kir û yên mayîn jî hatin koçber kirin. Gundê Pekran yê Ermeniyan ê Dîgora Qersê 50 kîlometre dûr sînorê Ermenîstanê ye. Piştî ku Ermenî tên tehcîr kirin Kurd li gundê wan bi cih dibin. Welatiyên Gund dibêjin, "Em hê jî di bin banên wan de dijîn."**

Gundê Pekran ê Dîgora Qersê ku 50 kîlometre dûr sînorê Ermenîstanê ye, di wesfa çîroka sînorê çêker ê di navbera her du gelan de ye. Kurdên piştî Ermenî hatin koçberkirin li gund bi cih bûn dibêjin "Hê jî em di bin banê wan de dijîn" û li benda wê rojê ne ku sînor bê vekirin.

Gundê Pekran ê Dîgora Qersê, li ser sînorê Tirkiye-





Ermenîstanê ye. Di navbera Pekran û Ermenîstanê de Çemê Arpaçay heye. Wexta di dema tehcîrê de Ermenî tên koçberkirin, Kurd li vî gundî bi cih dibin. Wexta Kurd bi cih dibin tu tiştî naguherînin û li malên ku Ermeniyan çêkirine dijîn. Li vî gundî 6 dêrên Ermeniyan hene.

Gund li newaleke ku li qeraxa Çemê Arpaçayê ye û 40 mal lê hene. Li vî gundî depoyên hewaya sar jî ji dema Ermeniyan mane. Tevî dîroka xwe ev gund bi axa xwe ya bi berhem jî tê zanîn. Gundî dibêjin tiştên ew diçinîn, hilberîna wan zêde ye. Li qeraxa Arpaçayê tevî darên sêv û gûzan, gelek darên fêkiyan hene û her sal gelek turîst tên gund.

Her wiha dêra 50 metre dûrî gund e û li nav sînorê Ermenîstanê ye jî hindik maye birûxe. Gundî dibêjin, leşkerên qereqola gundê wan dema terhîs dibin guleyan bera dêrê didin. Gundî tînin ziman ku demeke berê qereqol ji gund hatiye rakirin, lê belê dêreke li gund jî hatiye xerakirin û bi kevirên qê qereqol hatiye çêkirin.

Şêniyê gund Fewzî Şahîn, diyar kir ku sed sal in ew li vî gundî ne û got: "100 sal in em li vî gundî ne. Ev der gundê Ermeniyan bû. Wexta em hatin vir me tu xanî çênekirin. Ev mal hemû ên Ermeniyan e. Tenê di navbera me de av heye. Heta niha tu pirsgirêk di navbera me de rû nedane û em xweş li hev dikin."

**DI NAVBERA ME DE TENÊ SÎNORÊN ÇÊKIRÎ HENE**

Kazim Çoban ku gundî jê re dibêjin "Kazoyê Êzidî", diyar kir ku pirsgirêk di navbera gelan de tune ye, di navbera dewletan de heye û tenê di navbera wan de sînorên çêkirî heye. Çoban, anî ziman ku heta niha di navbera wan û gelê Ermenî de tu pirsgirêk rû nedane û dibêje: "Niha bang bikim wê dengê min biçe wir. Tenê di navbera me de 50 metre heye. Mêşên me yên hunguv diçin li kulîlkên wan, ê wan jî tên li kulîlkên me datînin. Em hinguvê kulîlkên wan, ew jî ên kulîlkên me dixwin. Carinan wexta ava çem dadikeve, heywanên me derbasî aliyê wan dibin û ew heywanên me dîsa dişînin aliyê me. Danûstendina navbera me pir xweş e."

**EM DI BIN BANÊ WAN DE DIJÎN**

Çoban ku 46 sal in li gundê Pekranê dijî got: "Dibe pirsgirêkên polîtîk ên dewleta hebin, lê pirsgirêkên me tune ne. Ji ber pirsgirêkên di navbera Tirkiye-Ermenîsatnê de beta me ji wir, a wan jî ji vir e. Mala min a Ermeniyan e. Her diçim malê dibêjim 'Xwedê ji wan razî be, hîn jî em di malên wan de ne.' Em şêniyên li vir hîn jî di bin banê wan de dijîn."

**DIVÊ SÎNOR BÊ VEKIRIN**

Çoban, diyar dike ku ew dixwazin sînorê Tirkiye-Ermenîstanê vebe û got: "Pirsgirêkên Tirkiyê gelek in, lê hîn jî bela xwe di sînorên welatan de dide. Bila Tirkiye pêşî pirsgirêka xwe çareser bike, paşê bi pirsgirêka Qerebaxê re eleqeder bibe. Pirsgirka kurd, a elewiyan, pirsgirêkên siyasî, pirsgirêka dîktayê, pirsgirêkên aborî. Gelek pirsgirêkên me hene. Divê em pêşî pirsgirêkên xwe çareser bikin. Pirsgirêka herî girîng pirsgirêka Kurd e. Divê pêşî ev bê çareserkirin, paşê birînên din bên cebirandin."...*MA*





Em di navbera me de tu pirsgirêk tune ne, lê dewlet bi zorê pirsgirêkan diafirîne. Em cîhaneke bêsînor dixwazin. Ez-

sînorê li vir nayê vekirin. Li wir gelek hevalên me hene. Ew dixwazin serdana me bikin, lê sînor girtiye. Pirsgirêka Qerebaxê dikin pirsgirêka me. Di navbera me de tu pirsgirêk tune ne, lê dewlet bi zorê pirsgirêkan diafirîne. Em cîhaneke bêsînor dixwazin. Ez-

---

Ronahî
şopdara rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 485 9- Mijdar- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî


## 2 hezar 500 sivîl hatine revandin, çarenûsa 850 kesî ne diyar e




Dewleta Tirk û çeteyên xwe piştî ku Efrîn dagirkirin, bê navber kuştin, revandin, talan, dizî, guhertina demografîk û hwd bê navber didomînin. Ji dagirkerina Efrînê heta niha di nav de 145 jin, 2 hezar û 500 sivîl hatine revandin. Her wiha çarenûsa zêdeyî 850 kesên ku hatine revandin jî ne diyar e.*R-5*

# OCALAN RÊBERÊ HEMÛ GELAN E

**Tecrîda giran ya li ser Rêber Ocalan dewam dike. Dewleta Tirk destûrê nade parêzer û malbatan biçin Îmraliyê. Fikar û nerazîbûnên derbarê rewşa Rêber Ocalan de jî zêde dibin. Çalakiyên ji bo azadiya Ocalan dewam dikin û bi van çalakiyan tê xwestin rojek zûtir agahî ji Rêber Ocalan were girtin.**




### RÊBER APO MAFÊ HEMÛ GELAN DIPARÊZE

Welatiyên ji pêkhateyên bajarê Qamişlo yên Kurd, Ereb û Suryan tecrîda li ser Rêber Ocalan şermezar kirin û diyar kirin ku wê bi azadiya Rêber Apo şer û qeyrana li Rojhilatanavîn bi dawî bibe. Welatiyan wiha gotin, "Rêber Apo mafên hemû gelan diparêze û reberê hemû gelan e. Em ê ji bo azadiya Rêber Apo têkoşîna xwe dewam bikin." Welatiyan bang li saziyên navnetewî jî kirin ku ji bo Ocalan bikevin nava tevgerê. *R-5*

### DIVÊ TEVGEREKE NAVNETEWÎ BÊ AVAKIRIN

Wekîla Swîsreyê Laûrence Fehlmann Rîelle diyar kir ku Konseya Ewropa û CPT jî di tecrîdkirina Ocalan de berpirsyar in û got, "ji bo Ocalan divê tevgereke navneteweyî ya ku gelek hêz di navê de ne, bê avakirin. Rewşa Ocalan gelekî girîng e. Bi rengekî vekirî mafên mirovan ên Ocalan tên binpêkirin. Pêwîste bi avakirina vê tevgerê divê rewşa Ocalan li qada navneteweyî bê vegotin." *R-4*

## Dewleta Tirk ji demokrasiya me ditirse




Hevserokê Meclîsa Rêveber a Kantona Girê Spî Hemîd El Abid diyar kir ku dewleta Tirk ji bo ku DAIŞ a ku li ber qedandinê ye rizgar bike êrîşî herêmên wan dike û wiha got, "Erdogan ji aramî û demokrasiya li herêmên me ditirse û dixwaze gemara xwe li herêmên me jî belav bike." *R-4*

## Partiya Çep biryara DYE'yê şermezar kir

Buroya Siyasî ya Partiya Çep a Kurd li Sûriyê biryara Emerîkayê ya derbarê sê rêveberên PKK'ê Mûrad Karayiln, Cemîl Bayik û Dûran Kalkan de şermezar kir û bang li Amerîkayê kir ku helwesta xwe zelal bike û bi keysbaziya Tirkiyê neyê xapandin. Partiya Çep got, "PKK tekoşîna azadiya gelê Kurd dide." *R-4*

## Demildest dev ji êrîşên li ser Rojava berdin



Hevserokê Giştî yê HDP'ê Sezaî Temellî diyar kir ku bi nêzîkbûna hilbijartinên herêmî Erdogan gefan li Rojava û Bakurê Sûriyê dixwe û bang kir ku dev ji êrîşên li ser rojava berde. Temellî wiha got, "Li Efrînê çawa bi destê çeteyên talanê dikin heman tiştî qeyûm jî îro li vir dikin. Lê bila baş bizanibin em ê wan şaredariyan hemûyan yek bi yek ji wan bistînin û wan ji wir biqewitînin." *R-4*

## Li Barzan, Sîdekan û Çelê 15 leşker hatin kuştin

Gerîlayên HPG'ê li herêmên Barzan û Sîdekan yê başûrê Kurdistanê û li Çelê ya Bakurê Kurdistanê li dijî artêşa Tirk çalakiyên bi bandor kirin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê bi daxuyaniyekê diyar kir ku di encama çalakiyên gerîlayên HPG/YJA Starê de 15 leşkerên Tirk hatin kuştin. *R-2*



## Divê jin li dijî tundiyê têkoşînê bilind bikin

Meclisa Malbatên Şehîdan ya Efrînê bi boneya nêzîkbûna 25`ê Mijdarê Roja Têkoşîna li dijî Tundiya li ser Jinan civînek ji hevjînên şehîdan re li navçeya Fafînê ya Şehbayê li dar xist. Hevseroka Meclisa Rêveber a TEV-DEM'ê Zelal Ceger di civînê de axivî û diyar kir ku jin rojane li dijî tundiyê li ber xwe didin û banga têkoşînê li jinan kir. *R-3*

## Li Dêrezorê 65 çete hatin kuştin



Navenda Çavdêriyê ya Mafên Mirovan a Sûriyê diyar kir ku di nava çend rojên dawî de li Dêrazorê zêdetirî 65 çete di encama çalakiyên şervanên QSD`ê û hêzên koalîsyonê de hatine kuştin. Navenda Çavdêriyê diyar kir ku 2 êrîşên DAIŞ'ê yên li dijî deverên bîrên petrolê yên li aliyê Hecînê hatine astengkirin. *R-2*

## Dagirkeran li Efrînê malbatek tune kirin




Kiryarên dagirkeran li Efrînê roj bi roj zêde dibin. Roj tune ku welatî bi hovîtî û wehşeta dagirkeran re rû bi rû nemînin. Vê carê jî malbatek bû qurbana hovîtiya dagirkeran. Hat ragihandin di encama teqîna mayîna çete û leşkerên Tirk ên dagirker de li navçeya Bilbil a Efrînê, ji heman malbatê 5 sivîlan jiyana xwe ji dest da. *R-2*

## Dayikên Aştiyê piştgirî dan Leyla Guven



Meclîsa Dayikên Aştiyê li Amedê bi daxuyaniyekê piştgirî da Hevseroka KCD'ê û Parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven ku li dijî tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ketiye greva birçîbûnê. Dayîkên Aşitiyê diyar kirin ku ew piştgiriyê didin wê û ew ê tim li gel wê bin. Dayîkên Aşitiyê xwestin tavilê Leyla Guven bê berdan. *R-2*

## Emê bi yekîtiyê, pilanan têk bibin



Berpirsa Karên Derve ya YNK'ê Şanaz Îbrahîm nerazîbûn nîşanî biryara DYE'yê derbarê sê pêşengên Tevgera Azadiya Kurd da û diyar kir ku ew ê Kurd bi yekîtî û hevgirtinê hemû planan têk bibin. Şanaz got, "Divê helwesteke cidî li hember vê biryara Amerîkayê were nîşandan." *R-3*

## Komeleya Êzidiyan ji nûve hat vekirin



Li herêma Efrînê bi hezaran Êzidî dijîn. Bi taybet piştî şoreşa Rojava bi awayekî azad xwe bi rêxistin kirin û rê û resmên xwe pêk anîn. Piştî ku dewleta Tirk û çeteyên xwe Efrîn dagirkirin cih û warên Êzidiyan jî hatin talan kirin û wêran kirin. Niha Êzidî ji careke din li herêma Şehbayê xwe birêxistin dikin. Bi vê armancê li Til Rifetê Komeleya Êzidiyan ji nûve hat vekirin. *R-6*

# Dagirkeran li Efrînê malbatek tune kirin

**Kiryarên dagirkeran li Efrînê roj bi roj zêde dibin. Roj tune ku welatî bi hovîtî û wehşeta dagirkeran re rû bi rû nemînin. Vê carê jî malbatek bû qurbana hovîtiya dagirkeran. Hat ragihandin di encama teqîna mayîna çete û leşkerên Tirk ên dagirker de li navçeya Bilbil a Efrînê, ji heman malbatê 5 sivîlan jiyana xwe ji dest da.**

Di encama teqîna mayîna çete û leşkerên Tirk ên dagirker ên berê li navçeya Bilbil a Efrînê bi cih kiribûn de, 5 sivîlan jiyana xwe ji dest da.
Li gorî agahiyên ji çavkaniyên herêmî hatin girtin, di encama teqîna mayîneke ya çete û artêşa Tirk a berê li navçeya Bilbilê bi cih kiribû de, ji heman malbatê Îsmaîl Îbîş Îsmaîl û Hemze Îbîş Îsmaîl û 3 kesên navên wan nehatin zanîn jiyana xwe ji dest dan.



## Li Barzan, Sîdekan û Çelê 15 leşker hatin kuştin

Li herêmên Barzan û Sîdekan ên Başûrê Kurdistanê û li Çelê di çalakiyên gerîlayên HPG/YJA Starê de 15 leşkerên Tirk hatin kuştin, 5 jî birîndar bûn. Li Zapê jî droneyeke artêşa Tirk hate xistin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyên gerîla yên li herêmên Barzan û Sîdekanê û derbarê operasyonên artêşa Tirk de daxuyaniyeke nivîskî weşand.
Di daxuyaniyê ev agahî hatin dayin:
"Hêzên me 7'ê Mijdarê saet 12'an li herêma Barzanê ya Başûrê Kurdistanê li dijî artêşa TC a dagirker a li ser Tepê Xwedê çalakiyek pêk anîn. Ji sê baskan ve li çeper û stargehên dijmin hate xistin û di encama çalakiyê de 5 çeperên dijmin hatin rûxandin. 10 leşker hatin kuştin.



Heman rojê saet 15'an, hêzên me li dijî leşkerên dijmin ên li ser Girê Lêlîkanê yê li herêma Sîdekanê ya Başûrê Kurdistanê çalakiyek pêk anîn. Derbên giran li çeper û stargehên dijmin hatin xistin, di encamê de çeper hatin rûxandin û 2 leşker hatin kuştin, 5 leşker jî birîndar bûn.
Hêzên me yên YJA Starê roja 7'ê Mijdarê saet 16:30'î li navçeya Çelê ya Colemêrgê li artêşa TC a dagirker a li ser Girê Şehîd Botan xistin. Di encama çalakiyê de ku derbên xurt li leşkeran hatin xistin, 3 leşkerên dijmin hatin kuştin.
7'ê Mijdarê saet 08:30'î, droneyeke ku li ser qada Kela Bêdehê ya herêma Zapê difiriya û keşf dikir, ji aliyê hêzên me ve hate xistin."

## Li Ezazê 2 teqîn pêk hatin



Roja 8'ê mehê li navçeya Ezaz yê bakurê Sûriyê li pey hev du teqîn çêbûn. Di encama teqînan de sivîl birîndar bûn.
Li bajarê Ezaz yê Sûriyê ku ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve hatiye dagirkirin, du teqînan rû da. Li gorî agahiyan sivîlên birîndar hene.
Çavkaniyan diyar kir ku teqîna yekemîn li Çerxerêya Seco pêk hatiye. Teqîn ji ber bombeyeke ku di otubusekê de hatibû bicihkirin, pêk hat. Di encama wê de 6 sivîl birîndar bûn û zirarên madî çêbûn. Hate zanîn ku di teqîna duyemîn de tu zirar çênebûne.

## Li Dêrezorê 65 çete hatin kuştin



Navenda Çavdêriyê ya Mafên Mirovan a Sûriyê diyar kir ku di nava çend rojên dawîn de zêdetirî 65 çete di encama çalakiyên şervanên QSD`ê û hêzên koalîsyonê de hatine kuştin.
Navenda Çavdêriyê ya Mafê Mirovan a Sûriyê destnîşan kir ku herî kêm 65 çeteyên DAIŞ`ê di baregehên xwe yên dawîn de di encama çalakiyên QSD`ê de hatine kuştin.
Di hefteya derbasûyî de QSD`ê piştî êrîşên artêşa Tirk a dagirker li ser herêmên Bakurê Sûriyê ragihand ku wan pêngava xwe ya Dêrazorê demkî rawestandine.
Lê Navenda Çavdêriyê ya Mafên Mirovan a Sûriyê diyar kir ku di rêzeêrîşên ezmanî de ji roja Duşemê ve 48 çete hatine kuştin û di nava wan de 2 êrîşên DAIŞ'ê yên li dijî deverên bîrên petrolê yên bakur devera Hecînê hatine astengkirin.
Li gorî navendê di encama çalakiyên QSD`ê li ser gundê El-Behre de ku çeteyan hewl dida parastina baregeha xwe bikin, 17 çete hatin kuştin.
Berdevkê fermî yê QSD`ê Kîno Gabriel diyar kir şevanên QSD'ê wê li dijî êrîşan parastina xwe bikin.

## Koalîsyona Navneteweyî û Tirkiyê dîsa li Minbicê dewriye kirin

Hêzên Koalîsyona Navneteweyî û artêşa Tirk a dagirker careke din li ser sînorê Minbicê dewriya hevpar kirin.
Hêzên Koalîsyona Navneteweyî û artêşa Tirk a dagirker li devera di navbera Hêzên Meclisa Leşkerî ya Minbicê û deverên di bin dagirkeriya Tirkiyê de yên li rojavayê Minbicê tev digerin û dewriyeyên hevbeş kirin.
Li devera ku her du dewriyeyên hevbeş rastî hev hatine balafirên keşfê bê navber digeriyan.
Hêzên Koalîsyonê û artêşa Tirk a dagirker ji 1'ê Mijdarê ve dewriyeyên hevbeş dikin û li gorî lihevkirina wan heftane wê carekê dewriyeyên xwe dewam bikin.



## Dayikên Aştiyê piştgirî dan Leyla Guven

Meclîsa Dayikên Aştiyê bi daxuyaniyekê piştgirî dan Hevseroka KCD'ê û Parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven ku li dijî tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ketiye greva birçîbûnê.
Meclîsa Dayikên Aştiyê ya Amedê, ji bo piştgiriyê bidin çalakiya greva birçînê ya bêdem û bêdorveger a Hevseroka Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) û Parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven, li avahiya meclîsê civîna çapemeniyê pêk anî.
Endama Meclîsa Dayikên Aştiyê Hawa Kiran, di civînê de axivî û wiha got: "Divê Guven tavilê bê berdan. Guven vîna gelê Kurd e. Ji ber ku piştgirî dide gelê Kurd wê bernadin."
Kiran da zanîn ku ew berî her tiştî çalakiya greva birçîbûnê ya Guven silav dikin û got: "Biryara Guven biryarek bi rûmet e. Ev biryar da û xwedî li têkoşîna gelê Kurd derket. Jinên Kurd ti carî li ber faşîzmê serî netewandine. Ew jî serê xwe qet natewîne û bi serbilindî gelê xwe temsîl dike. Em piştgiriyê didin wê û em ê tim li gel wê bin. Dewlet divê tavilê Guven berde. Divê êdî darbestên zarokên gelê Kurd ji girtîgehan neyên."



# Parastina Şoreşa Rojava parastina mirovahiyê ye

***Dokûmantera "Fermandar Arîan" ku ji aliyê derhêner Alba Sotorra ve hate amadekirin, roja 7'ê mehê li Parlamentoya Ewropayê hate nîşandan. Karaktera sereke ya fîlm Fermandara YPJ'ê Arîan bi rêya skype tevlî kombûna nîşandana fîlmê bû. Fermandar Arîan diyar kir, 6 sal in ew li dijî DAÎŞ'ê şer dikin û got, "parastina şoreşa rojava parastina mirovahiyê, em ê şoreşa xwe biparêzin."***



Piştî nîşandana fîlmê, karaktera sereke ya fîlm Fermandar Arîan bi rêya skypê tevlî çalakiyê bû.
Dokûmantera "Fermandar Arîan" a ji aliyê derhêner Alba Sotorra, êvara Çarşemê li Parlamenta Ewropayê (PE) hate nîşandan. Karaktera sereke ya fîlm Fermandara YPJ'ê Arîan bi rêya skype tevlî kombûna nîşandana fîlmê bû.
Tevî derhênera fîlm Sotorra, bavê şervana YPJ'ê Anna Campbell a li Efrînê şehîd bû Dîrk Campbell, Stelîos Koûlogloû û ji aktîvîstên Tevgera Jinên Kurd Dilar Dêrîk jî tevlî kombûnê bûn.

**DEWLETA TIRK DIXWAZE DAÎŞ'Ê XURT BIKE**

Fermandara YPJ'ê Arîan bi bîr xist ku ev 6 sal in li Rojava şerekî giran diqewime û got, "Ciwanên Kurd, Ereb, Tirk, ciwanên ji Ewropa û welatên din ên cîhanê li vê derê têdikoşin."
Fermandara YPJ'ê Arîan diyar kir, 6 sal in ew li dijî DAÎŞ'ê şer dikin û wiha dewam kir: "Me DAÎŞ têk bir, lê belê dewleta Tirk dixwaze wê ji nû ve xurt bike. Me hovîtiya dewleta Tirk bi taybetî li Efrînê dît. Banga me ew e ku ev êrîşên li dijî gelê Kurd biqedin."
Fermandar Arîan anî ziman ku wê Rojava biparêzin û bal kişand ser êrîşên dawî yên dewleta Tirk ên li ser Kobanê û Girê Spî. Arîan ev bang kir: "Pêşî li dewleta Tirk û her tişta alîkariyê dide DAÎŞ'ê bigirin."
Fermandara YPJ'ê Arîan diyar kir, parastina Rojava parastiya mirovahiyê ye û got, "Gef û êrîşên li ser Rojava dewam dikin. Dewleta Tirk gefê li hemû destketiyên me dixwe. Dixwaze jiyana me biqedîne. Lê em ê şoreşa xwe biparêzin. Di nava vê şoreşê de mirovahî heye, azadî heye."
Fermandar Arîan her wiha silav da bavê şervana YPJ'ê Campbell, Dîrk Campbell.
Beşdarên kombûnê jî demeke dirêj li ser piyan ji bo fermandara YPJ'ê Arîan li çepikan xistin.
Dîrk Campbel jî qala êrîşên dewleta TÎrk ên li ser gelên Rojava kir.
Bav Campbell, dîmenê Haci Loqman Bîrlîk ê li pişt panzerê bi erdê re hate kaşkirin û teşhîrkirina bedena şervana YPJ'ê Barîn Kobanê ya li Efrînê şehîd bû, nîşan da. Campbell got, di navbera dewleta Tirk û DAÎŞ'ê de ti ferq nîne.
Campbell diyar kir, keça wî di dema êrîşa dewleta Tirk de li Efrînê jiyana xwe ji dest da û ji bo gelên Rojava banga piştgiriyê kir.
Dokûmanter li ser çîroka şexsî ya fermandara YPJ'ê Arîan, şervanên jin, wêrekî û biryardariya wan, berdêlên dane û berhemên afirandine ye.

## Li Dêrikê şopên şaristaniyan: Qesra Mameşûrê




Yek cihên ku şaristanî û dîroka cîhanê diparêze jê Qesra Mameşûrê ya Dêrikê ye. Dema ku mirov diçe vê Qesrê bêhna wan fireh dibe û dilê wan xweş dibe. Qesra Mameşûrê ya Gundê Dêrikê gelek şopên şaristaniya ku rûyê cîhanê geş kiriye di nava xwe de vedihewîne. Qesra Memeşûrê navê xwe ji gundê ku girêdayî wê ye girtiye. Ji dîrokê heta niha ji êlên wekî Xerza, Botan û Ebasanan re malovantî kiriye. Bi bawerî û şaristaniyên cuda hêviyên mezin di dilê civakan de ava kiriye.

**JI BO KOÇERAN BUYE STARGEH**

Qesra Mameşûrê li ser girekî cihê xwe digire û ji 15 odeyan pek tê. Koçerên ku diçin zozanan Qesra Mameşûrê ya ku bi kevirên reş hatiye avakirin wekî stargeh ji xwe re didîtin. Di qesra ku koçeran ji xwe re wekî stargeh didîtin de gelek bîranîn, şaristanî, çand û huneran di nava xwe de dihewîne. Ev yek ji bo gelek cihan jî bûye mînakek berbiçav. Dema ku mirov niha jî diçe Qesra Mameşûrê şopên şaristanî û dîrokek dûdirêj dibîne.
Piştî ku Fransayê ev Qesra girt şûnde vir wekî navenda leşkerî bi kar tîne. Kesên ku dîl tên girtin li vir gelek zilm û zordestiyê dibînin. Qesra Mameşûrê ya ku di heman demê de ji êşên mezin re jî malovantî kiriye, niha deriyê xwe ji mirovên dîrokhez re vekiriye û li hêviya serdanê ye…***JINNEWS***

## Strana me, peyama berxwedanê ye



Hunermend Ehmed Xanî derbarê strana xwe ya têkildarî berxwedana Efrînê de wiha got: "Strana me amade kiriye, peyama berdewama rihê berxwedana şêniyên Efrînê yên li Şehbayê ye."
Welatiyên Efrînê ji ber êrîşên dagirkeriya Tirk û çeteyên wê neçar man ji bajarê xwe derkevin û li Şehbayê bi cih bibin. Yek ji armancên êrîşên Tirkiyê, qirkirina çanda gelê Kurd li Efrînê ye. Saziyên çandî û hunerî li Şehbayê ji nû ve xwe bi rêxistin kirin.
Derbarê mijarê de, li kampên Şehbayê Yekitiya Hunermendan klîbek li ser pêngava duyemîn a Berxwedana Serdemê, amade kir.
Strana `Berxwedana Efrînê` li ser berxwedana welatiyên Efrînê ye ku 58 rojan dewam kir, niha jî li Şehbayê di pêngava duyemîn a Berxwedana Serdemê de berxwedana xwe dewam dikin.
Derbarê mijarê de hunermend Ehmed Xanî axivî û da zanîn ku êrîşa li ser Efrînê ne tenê êrîşekî leşkerî bû û wiha got: "Êrîşa dagirkeriya Tirkiyê li ser çanda gelên herêmê bû, mînaka wê jî piştî dagirkirina Efrînê çeteyan peykerê Kawayê Hesinkar rûxand."
Hunermend Ehmed Xanî di berdewama axaftina xwe de wiha got: "Divê em xwe bi rêxistin bikin û tevî derfetên kêm şêniyên Efrînê jiyanek afirand. Baweriya me ya bi îradeya me hişt ku em ji nû ve xwe bi rêxistin bikin."… ***ANHA***

## Hunermendî



**Xelîl XEMGÎN**

Di vê serdema ku hemû civak ser û bin diçelqin û dihejin de, bi baweriya min, di afirandina kesayeta civakî de, tevgera azadiyê çavkanî û lêvegera herî hemdem, yekane û ewle ye. Di van çil salên dawiyê de, vê lêvegera felsefî û bîrdozî qet nebe, kesayetek serbixwe, xwebûnek haydar û rêbazek parastina mirovahiya resen ava kiriye. Ne tenê ji bo civaka me, ji bo hemû mirovahiyê şêwaz û modêlek bi mînak damezirandiye. Çavkaniya bîrdozî ya Tevgera Azadiyê însan e.
Ji sedî sed ji vê rastiyê bi bawer im ku sal û demên pêş de ev lêvegera felsefî û bîrdozî, ji bo gelan û civakan ê bibe çavkaniya lêgera çareseriyê. Ji bo hemû pirsgirêk û qeyranên mirovahiyê, fikir û ramanên Rêber Apo wê bibin çavkaniya lêveger a qasidên lêkolînêr û lêgera çareseriya pirsgirêkên mirovahiyê. Nexwe, ji bilî vê yekê qeyranên civata mirovahiyê, ji çavsorî û wehşeta moderniteya kapîtalîst de, ji feodalîzma kevinperest, ji destpotîzma netewdewlet de, heta harbûna şehweta desthlatdariya idolojiyên kevinperest û tunderew, ji xerckirin û talankirina çavkaniyên aborî û sohtandin û texrîbatên li ser xwezayê. Ka çend fikir, raman û alternetifên çareserî ên pergala serdestên cîhanê hene? Îro em xwediyê van nirxên mezin in, lê mixabin, hîn piraniya me, em ne di ferqa vê yekê da ne. Xemsarî nexweşiya me ya klasîk e. Pirsa "dîrok xwe dubare dike" tê bîra mirov: gelo raste, mîna Salahedînê Eyubî, edalet û maf, aştî û hiqûqa dinyayê em ê ava bikin. Lê gelo dîsa em ê ji van nirxan bêpar bimînin? Ger em vê "klasîka" xwe wilo bidomînin, bi dîtina xwe û bi mixabînî dibêjim: Erê. Ji ber ku piraniya me, ne di ferqa gewherê vê nirxa giranbûha de ne. Beşek jî di ferqê de ye lê li pey berjewendiyên biçûk ketine.
Ger ev şoreşa neba nêçîrvanên sud wergêr, manfatperestan, bazirgan û maldaran jî, nikarîn xwe li ber hovîtiya pergalên dagirker bigrin. Dixwazim serpêhatiyeke Selahaddîn Soro bi we re parve bikim. Soro vexwendine semînera karmend û bazirganan. Piştî axaftin û şîroveyan mirovek ji çenteyê xwe pirtûka Ocalan derdixe û dibêje; kurd naxwînin. Soro dixwaze helwesta wî hîn bibe û vê pirsê dipirse; Tu mirovekî karmend û bazirgan î çi pêwîstiya te xwendina vê pirtûkê heye? Got ez kar û barê xwe li gorî demê rêve bibim, çareseriyan bi dest bixim pêdiviya min bi van ramanan heye.
Kambaxiya herî mezin di vê serdemê de xwe diyar dike û ev jî beşa kesên tenê ji ber dikin û dirûşman berz dikin û populîst in. Di vejîna nirxên şoreşê de herî zêde ew pirsgirêkan dijîn. Derd û merema hinek kesan berjewendiyên takekesî ne û êdî civak jî wan nas dike. Lê bi ser navê bîrdoziyê tevdigerin, nûnertiya resen bi cih naynin, mixabin kambaxî di vê xalê de ye.
Nûnertiya resen ji exlaq, wijdana mirov dest pê dike. Ger tu bi fikir û ramanê bîrdoziyekî bawer kiribe, pêwîste mirov zanibe û mirov mecbure li hemberî vê bîrdoziyê nûnertiya xwe ya exlaqî ji dil bi cih bîne. Ger wisa ne be wê demê mirov durûtiyê li civat û bîrdoziya xwe dike.
Xwendevanên hêja, em ê vê mijarê bidomînin, lêbelê bi boneya meha mijdarê dixwazim van hestan bi we re parve bikim; di ezmûna 40 salî de teqez bûye ku kesên demogog, jiberker (ezbercî) û populîst ku xwestine vê rêbazê li gorî xwe veguhezînin hemû têk çûne…
***Çavkanî/ê-rojname***

# Komeleya Êzidiyan ji nûve hat vekirin

**Li herêma Efrînê bi hezaran Êzidî dijîn. Bi taybet piştî şoreşa Rojava bi awayekî azad xwe bi rêxistin kirin û rê û resmên xwe pêk anîn. Piştî ku dewleta Tirk û çeteyên xwe Efrîn dagirkirin cih û warên Êzidiyan jî hatin talan kirin û wêran kirin. Niha Êzidî ji careke din li herêma Şehbayê xwe birêxistin dikin. Bi vê armancê li Til Rifetê Komeleya Êzidiyan ji nûve hat vekirin.**

Êzidiyên Efrînê bi mebesta ku rê û resmên xwe yê olî pêk bînin Komeleya Êzidiyan a Efrînê li navçeya Til Rifetê ji nû ve vekir. Jinên Êzidî diyar kirin wê li hemberî dagirkeran têkoşînê bikin heya Efrînê rizgar bikin.

Bi hezaran Êzidî li Efrînê dijiyan. Bi dehan gundên Êzidiyan li Efrînê hene. Ger wiha li Efrînê gelek pîrozgehên Êzidiyan hene. Êzidiyên Efrînê bi destpêkirina Şoreşa Rojava re bi awayekî azad rê û resmên xwe pêk dianîn. Bi destpêka êrîşên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê yên li dijî Efrînê, di nav de gundên Êzidiyan bi awayekî hovane hatin hedefgirtin, her wiha pîrozgehên wan hatin talankirin û xirabkirina. Di heman demê de bi sedan Êzidî hatin revandin û çarenûsa gelekan nayê zanîn.



Êzidiyên Efrînê ku ji ber hovîtiya dagirkeran li Şehbayê bi cih bûne bi armanca ku rê û resmên xwe yên olî pêk bînin 3‘yê Mijdarê Komeleya Êzidiyên Efrînê ji nû ve li navçeya Til Rifet vekir. Komeleyê civaka Êzidî di bin banê komeleyê de dîsa kom kir. Êzidiyên Efrînê perwerdeyên xwe yên fikrî girêdayî çanda Êzidiyan li vê komeleyê dibînin.

Endama komeleyê Fula Şakiro têkildarî mijarê wiha got: “Fikra jinûvevekirina navendeke taybet ji bo Êzidiyan di serî de ji bo têkbirina plan û komployên dijminan ên li ser gelê Êzidî ye. Ji ber ku hêzên dagirker dibînin ku derxistina şêniyan bi zorê, rûxandina goran û reşkirina baweriya Êzidiyan dawiya Êzidiyan e. Lewre vekirina vê navendê israr û berxwedana gelê Êzidî û girêdana wan bi çand û baweriya xwe nîşan dide.”

Dayîka bi navê Henan Nesro wekî gelê Êzidî di nava şert û mercên zehmet de ev navend vekirine û diyar kir ku ew bi hemû keda xwe piştgiriyê bidin malbatên Êzidî û hevjînên şehîdan.

Henan Nesro di dawiya axaftina xwe de anî ziman ku ew ê têkoşîna xwe ya li hemberî dagirkeriya Tirkiyê li Şehbayê bidomînin heta Efrînê rizgar bikin…*ANHA*

## Li Şehbayê madeyên dembuhurî tên zevtkirin

**Idrîs HENAN**



Piştî hatine gelê Efrînê ya herêma Şehbayê, ji bo ku derfetên jiyanê dabîn bike, dest bi vekirina maseyên firotinê û hinek dikanên biçûk kir. Şêniyên Efrînê madeyên xwe bi riya bazirganan dabîn dikirin. Lê ji ber çewsîneriya bazirganan hinek caran madeyên demborî derbasî Şehbayê dibûn. Ji bo ku ev kiryara bazirganan bandor li ser tendirustiya gel neke, Komîteya Çavdêriya Tendirustiyê di bin sîwana Desteya Tendirustiyê de hate aktîvkirin.

### ARMANC PARASTINA TENDIRUSTIYA GEL E

Endamê Rêveberiya Komîteya Çavdêriya Tendirustiyê li Şehbayê Menan Hecîko diyar kir ku armanca me ne bac e, parastina tendirustiya gel e û wiha dewam kir: Di bingeha vê komîteyê de bac û muxalefetên bi pere nînin. Ji bo ku rê li ber belavbûna hinek nexweşiyên girêdayî xwarin û vexwarina xerab bê girtin, Em avakirina têgihaştineke tendirust hedef dikin. Derbarê tiştên têne desteserkirin de Hecîko got: Dema ku em derbasî dikanan an cihên xwarin û vexwarinê dibin û tiştên dembuhurî dibînin, demildest em zeft dikin.



### DI CIH DE MADE TÊN TELEFKIRIN

Hecîko eşkere kir ku madeyên têne zeftkirin jî li ber raya giştî têne şewitandin û wisa dirêjahî da gotinên xwe: Xwediyên madeyên dembuhurî carinan li dijî karê me derdikevin. Carinan înan nakin ku ev madeyên hatine zeftkirin bêne telefkirin. Ji ber wê em bi rêbaza di cih de îtlafkirin madeyan li pêşberî xwediyên wan dişewitînin. Madeyên li navenda me hatine komkirin jî bi koordîneya bi saziyên têkildar û alavên ragihandinê re têne şewitandin. Hecîko derbarê vê xala telefkirinê de ev agahî parve kir: Tiştên mîna (bafûn, plastîk, şûşe û qutiyên tenekî,… ) hwd, ji bo ku ziyanê negihînin hawîrdor û jîngehê nayên şewitandin. Bi koordîneya bi şaredariyê re ji bo cihên guncav tên veguhestin.

### 150 REWŞ HATINE ZEFTKIRIN!

Menan Hecîko Rêveberê Komîteya Çavdêriya Tendirustiyê li Şehbayê derbarê rêxistinbûna karê xwe de ev agahî bi me re parve kir: Endamên Komîteya Çavdêriya Tendirustiyê li Şehbayê bi qasî 8 kesên pispor in. Li Şêrawa jî du endamên me hene. Hecîko got: Ji ber jimara kêm a endaman em li gorî planzaziyeke heftane gera xwe ya çavdêriyê li gund û navçeyên Şehbayê organîza dikin. Li gorî plansaziya me pêwîste gera me ji heft heya deh rojan hemû herêma Şehba bigira nava xwe. Hecîko diyar kir ku; di nava du mehên çavdêriyê de bi qasî 150 rewşên muxalîf hatine zefkirin. Piraniya madeyên têne desteserkirin jî xwarin û vexwarinên hazir in.

### PAZIRGAN REWŞÊ DIÇEWISÎNIN

Hecîko derbarê rêjeya zeftkirinê de got: Li gorî hîm û jimara madeyên di nava du mehan de li tevhî Şehbayê hatine zefkirin, rewşa muxalefetê kêm e. Rewşên derketine jî girêdayî hîle û çewsîneriya bazirganên rejîm



û yên şer in. Bazriganan bi hatine gelê me ya Şehbayê re hemû tiştên xwe yên dembuhurî derbasî vê herêmê kirin û li ser pişta tendirustiya gelê me bazirganiya xwe kirin. Komîteya Çavdêriya Tendirustiyê hewceyeke esas a parastina jiyan gel e.

Rêveberê Komîteya Çavdêriya Tendirustiyê li Şehbayê di derbarê gilî û gazinên gel de ku dibêje, bila tiştên dembuhurî beriya ku têkevin Şehbayê bêne desteserkirin ta ku zirar negihîne dikanciyan, di dawiyê de got: Ji xwe berê li Efrîn wiha bû. Madeyên derbasî kantonê dibûn saziya gumrikê kontrol dikir. Lê niha ji ber rewşa dagirkerî û serfeberiyê ew derfeta kontrolkirinê nîne. Ancax em bi riya komîteya xwe karibin van rewşan zeft bikin.

## Stada Hesekê tê sererastkirin


Xebatên sererastkirina stada Hesekê ber bi dawiyê ve diçe. Xebatkarên şaredariyên gel ên bajarê Hesekê beriya hefteyekê dest bi sererastkirina stada bajarê Hesekê kirin.

Yek ji kesên ku xebatên sererastkirinê dişopîne Hecî Abdulsemid diyar kir ku wan ji destpêka meha Mijdarê ve dest bi xebatên sererastkirina stadê kiriye û destnîşan kir ku wê di nava du hefteyan de bi dawî bibe.

Abdulsemed di axaftina xwe de diyar kir ku bi awayekî zêde stad hatibû xirakirin û diyar kir ji bo ku zû bi dawî bibe ew xebatên xwe bi lez didomînin. Abdulsemed diyar kir ku 55 xebatkar bi şev û roj xebatên sererastkirinê dikin da ku di zûtirîn demê de bi dawî bikin.


Stada bajarê Hesekê ji mezintirîn stadên herêma Cizîrê ye. Cihê 20 hezar kes tê de heye. Tê payîn ku sererastkirina stadê beriya 12`ê Mijdarê bi dawî bibe.

Hevserokê Şaredariya Gel a



Xerbî ya bajarê Hesekê Mizgîn Demir Qaya diyar kir ew bi hemû derfetên xwe dixebitin ji bo ku stadê sererast bikin…*ANHA*

### RAMANÊ RÊBERTIYÊ



## Hevjiyana Azad -10-

**Abdulah Ocalan**

b- Jin nebûbe keseke zewacê, divê ji bîr neke ku di her qada civaka mêrê serwer de mêr ê bi psîkolojiya pilingekî her kêlî xwe çeng bike ser nêçîra xwe tevbigere, lewma divê ew jî şêwazê tevgera xwe li gorî vê pêk bîne. Piling kengî firsendê bibîne ango kengî astengekî civakî yê karibe jê bibihure derkeve pêşiyê, wê pencekî xwe biavêje jinê. Mêrê desthilatdar di vê kêliyê de wê ti sedema exlaqî û wijdanî nas neke û wê bixwaze jinê bike nêçîra xwe. Ne sergirtina dînî, ne jî huqûq li pêşiya vê asteng nînin. Divê jin bi vê rewşê zanibe û wisa derkeve qada civakî, ya rastî, garantiyeke xweparastinê nebe divê jin danekeve qadên civakî yên xirûxalî û kes lê tinebe.

c- Divê jin ji bîr neke ku hedefa bingehîn a modernîteya kapîtalîst ew e, jinê bike koleyeke modern, nexasim vê jî hem bi rêbazên hişk ên hêza pere û desthilatdariyê îfade dikin, hem jî di serî de wêje bi rêbazên nerm ên hêza hunerê nîşan didin pêk tîne. Modernîte li hemberî jinê, çi bi rêbazên pere û desthilatdariyê, çi jî bi gelek sozên ji bo eşqê dide, di wê pozîsyonê de ye ku ji mêrê civaka berê qatbiqat zêdetir bi hêza êrîşê rabe. Li hemberî hêza xeternak a mêrê serwer pere û desthilatdariyê, gera jinê ya li jiyana azad ji xeyaleke tewş wêdetir ti maneya xwe nîne. Herçiqasî bi tevahî bi duristî û tevgerên xwe yên xweşik nêzîk bibe û li pey hevjiyana azad biçe jî jin li hemberî mêrê modernîteya heyî nikare xwe ji têkçûnê rizgar bike. Ango her rê wê bibe koletiya jinê ya modern.

d- Eger jin tevî vê civaka mêrê serwer hemûyî di azadmayînê de israr bike, hingê divê yan xwe li jiyaneke tenêbûna wê mezin an jî li zehmetiyên milîtaniyek e ku her kêliya wê bi têkoşîna sosyalîstiyê tijî derbas dibe, ragire. Tenêtî ji bo rewşên marjînal e. Jiyana sosyalîst jî jiyaneke xwedawendan a di hemtayê çanda xwedawendên berê de ferz dike. Divê neyê jibîrkirin ku yek ji xisletên xwedawendan ew bû ku bi mirovên mêr re nedizewicîn. Lê kengî mêr bû xweda, em ji dîrokê dizanin ku ji xwedawendan zêde tiştek nema. Ya ji jinê re dimîne melekbûn e. Lê jina bûye melek jî jina hinekî hêza xwe ya cins wenda kiriye temsîl dike. Jineke bi vî rengî, di civakê de ji rola qasidbûnê wêdetir ti rola wê namîne. Di mîtolojiyê de fîgura Înanna-Afrodît jineke cudatir e. Rûyekî jinê yê xweşikiya xwe, balkêşiya xwe ya cinsî û hêza xwe ya bedenî hê ji dest nedaye temsîl dike. Înanna-Afrodît weke Xwedawenda Eşqê hêmana hevjiyanê ya lê bigere, ew hêman e ku karibe hevjiyana azad pêre parve bike. Divê baş were fêhmkirin ku bi pirranî hêmanekî bi vî rengî bi tenê nîv-xweda û nîv-mirovekî mêr ê mîna Prometheûs e. Di dîrokê de û di roja me ya îro de ev hêman an jî bi pirranî mêr, mirov bi tenê dikare weke fîgurekê tesewir bike. Bi şerekî dûrî aqilan mirov dikare wî berbiçav bike. Jin heta xwedayên bêmaske yên xwe bi hêzên xeternak ên modernîteya kapîtalîst gurçûpêç kirine têk nebe nikare xwe pêk bîne. Ev berbiçavkirineke zor e, lê bêîmkan nîne. Sosyalîstbûn, hinekî jî berbiçavkirina îmaja Înanna-Afrodît û Prometheûs pêkan e.



# Emê bi yekîtiyê, pilanan têk bibin

**Berpirsa Karên Derve ya YNK’ê Şanaz Îbrahîm nerazîbûn nîşanî biryara DYE’yê derbarê sê pêşengên Tevgera Azadiya Kurd da û diyar kir ku ew ê Kurd bi yekîtî û hevgirtinê hemû planan têk bibin. Şanaz got, “Divê helwesteke cidî li hember vê biryara Amerîkayê were nîşandan.”**

Berpirsa Karên Derve ya YNK’ê Şanaz Îbrahîm Ehmed nerazîbûn nîşanî biryara Amerîka ya ji bo girtina sê pêşeng û şoreşgerên Tevgera Azadiya Kurdistanê da û got, “Em ê bi yekgirtinê vê pilana li dijî pêşengên xwe têk bibin.”

Berpirsa Karên Derve ya Yekîtî Nîştîmanî Kurdistanê (YNK) Şanaz Îbrahîm li ser rûpela xwe ya fermî ya medya civakî, nivîsek derbarê biryara Amerîkayê ya li dijî sê şoreşgerên Kurd (Cemîl Bayik, Duran Kalkan, Murad Karayilan) de weşand. Şanaz Îbrahîm nerazîbûn nîşanî biryara Amerîkayê da û diyar kir ku wê Kurd şoreşgerên xwe nefiroşin û vê pilana wan bi yekdengî têk bibin.

Şanaz Îbrahîm ev biryara Amerîkayê weke siyaseteke bêşerm û şeklî ya li gel Tirkiyê bi nav dike û dibêje, “Ji bo Hevalê Cemîl Bayik, Murad Karayilan û Duran Kalkan 12 Milyon dolar xelat danîn e. Ev biryara Amerîkayê di encama siyaseteke bêşerm û dilxweşker a ji bo Tirkiyeke li derve û navxweyî de di nava qeyranan de dijî de hatiye girtin. Lê divê helwesteke cidî li hember vê biryara Amerîkayê were nîşandan.”

Ji bo têkbirina van pilanên li dijî pêşengên Kurd Şanaz Îbrahîm berxwedana Kobanê û çend nimûneyên din bibîr dixe û wiha dibêje, “Me li Kobanê dît ku yekîtiya Kurd ya fikrî, siyasî û girseyî hişt ku berxwedana Kobanê li cîhanê deng vede û YPG di aliyê leşkerî de li dijî hêza herî qirêj DAIŞ’ê serkeftine mezin bidest bixe. Eger gelê me bi awayeke lezgîn û bi şêweyeke girseyî helwest nîşa bidin û ev pilana girtina şoreşger û pêşengên Kurdistanê wê jî sernekeve. Wê hemû cîhan jî bibîne ku gelê Kurd êdî ne ew Kurdê ji hev belavbûyî û lewaz e.”

Şanaz Îbrahîm di beşa dawî ya nivîsa xwede jî parastina van pêşengên Kurd weke erkeke exlaqî û mirovî dest digire û nivîsa xwe bi van gotinan bi dawî dike, “Eger



Amerîka pere li beramber têkoşerên me pêşkêş dike, tişta ku dikeve ser milê me Kurdan jî, parastina van têkoşerên xwe ye. Parastina têkoşerên xwe jî erkeke exlaqî û însanî ya pîroz e. Em ê bidin nîşandan ku Kurd, şoreşgerên xwe nafiroşin.”

## 3 hezar mamosteyên jin perwerdê didin



Salek li ser rizgarkirina Reqayê re derbas bû. Di nava vê salê de jinan di aliyê perwerdeyê de gavên girîng avêtin. Li bajêr hêjmara mamosteyên jin gihiştiye 3 hezar.

Piştî ku bajarê Reqayê ji aliyê QSD’ê de ji çeteyên DAIŞ’ê hat rizgar kirin jin jî di her alî de tevlî xebatên ji nûve avakirinê bûn. Di vê çarçoveyê de Buroya Jinan a Komîteya Perwerde û Fêrkirinê mamosteyên jin amade kirin û li ser dibistanan belav kirin. Her wiha ji bo ku jin xwe ji nû ve bi rêxistin bikin, buroyê dewreyên perwerdeyê ji mamosteyên jin re vekir.

Têkildarî mijarê Endama Komîteya Perwerde û Fêrkirinê ya Reqayê Nehla El-Salim axivî û wiha got: “Piştî salekê rizgarkirina bajêr, ji ber fikra tarî ya DAIŞ’ê ku pêşxistibû me gelek zehmetî kişand heta ku me xwendekarên keç tevlî dibistanan kir.”

Nehla wiha dewam kir: “Piştî vekirina dewreyên perwerdeyê ji jinan re û xurtkirina têkiliyan di navbera xwendekar û mamosteyan de, me ew astengî derbas kirin. Niha hejmara mamosteyên jin li dibistanên Reqayê 3 hezar e.”

Di berdewama gotinên xwe de Nehla got: “Ji ber zîhniyeta mêrdestiyê me zehmetî bi xwendekarên keç re jî kişand. Lê piştî danûstandinan bi wan û malbatên wan re me pirsgirêkên wan çareser kirin.”

Endama Komîteya Perwerde û Fêrkirinê Hîba El-Xelef jî destnîşan kir ku dema serweriya çeteyên DAIŞ’ê de li bajêr, perwerde di çarçoveya fêrkirina Quran û ola îslamê bi awayekî tundrew di mizgeftan de dihat dayîn. Hîba El-Xelef di dawiyê de wiha got: “Ji bo gihandina civakeke bi exlaq û azad li ser bingeha azadiya jinan, em ê xebatên xwe bidomînin.”…*ANHA*

## Derbarê tundiya li ser jinê de semîner hat dayin



Bi pêşengtiya Yekîtiya Rewşenbîrên Kantona Qamişloyê li Tirbesipiyê semîner li dijî tundiya li ser jinê hate dayîn.

Bi pêşengtiya Yekîtiya Rewşenbîrên Kantona Qamişlo û alîkariya Rêxistina Sara ya li dijî tundiyê ser jinê, semînereke xweser li Saziya Zimanê Kurdî (SZK) ya Navçeya Tirbespiyê hate dayîn. Rewşenbîr, xwendekar û mamoste li semînerê amade bûn. Semînere ji aliyê Rêvebera Rêxistina Sara ya li dijî tundiya li ser jinê Mûna Ebduselam ve hat dayîn. Mûna di semînerê de da zanîn ku beriya Şoreşa Rojava rewşa jinê xirab bû û piştî Şoreşê jinê xwe nas kir û gihişt asta azadiyê. Mûna di axaftina xwe de bal kişand ser asta zanebûna jinê û diyar kir ku jinên ku perwerdeyê bibînin bêtir li dijî tundiyê dikarin têbikoşin. Mamosteyên ku tevlî semînerê bûn destnîşan kirin ku zewaca di temenê biçûk de jî tundî ye û ji dayikan xwestin ku keçên xwe di temenê biçûk de nezewicînin û riya rast nîşanê wan bidin…

*JINNEWS*

## Li Reqayê amadekariyên 25’ê Mijdarê

Endama Rêveberiya Jinan a Reqayê Zelîxa Ebdî destnîşan kir ku ew ê bi boneya Roja Têkoşîna li dijî Tundiya li ser Jinan bi hemleyek berfireh rabin. Zelîxa da zanîn ku herî zêde jinên Reqayê di encama zextên DAIŞ’ê de zehmetî dîtine.

25’ê Mijdarê Roja Têkoşîna ya li dijî Tundiya li ser Jinan e. Li bajarê Reqayê piştî rizgarkirinê ev cara yekê ye ku wê çalakî bi vê boneyê werin lidarxistin.

Têkildarî mijarê Endama rêveber a Rêveberiya Jinan a Reqayê Zelîxa Ebdî axivî û destnîşan kir ku hemleya wan berfireh e û wê gelek çalakî pêk werin.



Zelîxa Ebdî wiha dewam kir: “Bi rêya lidarxistina semîner û panelan di nav saziyên bajêr de em ê tundiya ku li dijî jinan pêk hatiye û têkoşîna li dijî wê, pênase bikin.” Zelîxa diyar kir ku ji bo vê rojê bernameyeke dagirtî amade dikin. Tê de panel û semîner têkildarî pênasekirina tundiyê wê werin lidarxistin û balavok wê werin belavkirin . Her wiha Zelîxayê da zanîn ku ew ê di 25’ê Mijdarê de meşeke mezin li dar bixin.

Endama Rêveberiya Jinan a Reqayê Zelîxa Ebdî di dawiyê de ev tişt anîn ziman: “Li ser bingeha felsefeya neteweya demokratîk a ku azadiya jin û civakê esas digire, em ê ji bo jinên Reqayê jiyaneke nû biafirînin. Ji ber ku jinên Reqayê ji DAIŞ’ê gelek êş û zilm dîtine.”

## Divê jin li dijî tundiyê têkoşînê bilind bikin

Zelal Ceger diyar kir ew rojane li dijî tundiya li ser jinan li ber xwe didin û anî ziman ku berxwedana jinên Efrînê bersiva li hemberî tundiya dewleta Tirk e.

Meclisa Malbatên Şehîdan a kantona Efrînê bi boneya nêzîkbûna 25`ê Mijdarê Roja Têkoşîna li dijî Tundiya li ser Jinan civînek ji hevjînên şehîdan re li navçeya Fafînê ya girêdayî kantona Şehbayê li dar xist.

Di civînê de hevseroka Meclisa Rêveber a Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) Zelal Ceger li ser girîngiya 25`ê Mijdarê Roja Têkoşîna li dijî Tundiya li ser Jinan axivî û diyar kir ku divê hemû jin li dijî tundiyê têkoşînê bikin.

Zelal Ceger wiha axivî: “Em li hemberî tundiyê rojane têdikoşin. Berxwedana jinên Efrînê li dijî faşîzma Tirkiyê bersiveke xurt e. Divê heta kantona Efrînê tê rizgarkirin jin asta têkoşîna xwe bilindtir



bikin.”

Zelal Ceger behsa parastina hevjînên şehîdan û nirxên şehîdan kir û wiha dewam kir: “parastina rêgeza şehîdan li ser milê hevjînên şehîdan e û divê bi rêya xweperwerdekirin û pêşxistina hişmendiya xwe pêk were.”

Hevseroka Meclisa Rêveber a Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) Zelal Ceger di dawiya axaftina xwe de bang li hevjînên şehîdan kir ku hişmendiya xwe bi pêş bixin û jiyana xwe azad bidomînin û li hemberî zîhniyeta serdest têkoşîna xwe bi pêş bixin…

*ANHA*

# Dewleta Tirk ji demokrasiya me ditirse

**Hevserokê Meclîsa Rêveber a Kantona Girê Spî Hemîd El Abid diyar kir ku dewleta Tirk ji bo ku DAIŞ a ku li ber qedandinê ye rizgar bike êrîşî herêmên wan dike û wiha got, "Erdogan ji aramî û demokrasiya li herêmên me ditirse û dixwaze gemara xwe li herêmên me jî belav bike."**

Hevserokê Meclîsa Rêveber a Kantona Girê Spî Hemîd El Abid diyar kir ku ji ber ku DAÎŞ li ber qedandinê ye Erdogan êrîşê dibe ser herêmên wan û da zanîn ya ku ji DAÎŞ'ê nehat, niha Erdogan dixwaze bike.

Hevserokê Meclîsa Rêveber a Kantona Girê Spî Hemîd El Abid li ser êrîşên dewleta Tirk ji ANF'ê re axivî.

El Abid diyar kir, Erdogan ji rewşa demokratîk a li Girê Spî ditirse ji ber ku naxwaze li herêmê demokrasî hebe. El Abid got, "Li Efrîn, Bab, Cerablûs û Ezazê ku ji aliyê dewleta Tirk ve hatiye dagirkriin, rojane komkujî, destavêtin û talan heye. Lê li herêmên me tiştekî wiha nîne. Erdogan ji aramî û demokrasiya li herêmên me ditirse û dixwaze gemara xwe li herêmên me jî belav bike."

El Abîd diyar kir, sala 2013'an bi fermana Tirkiyê 21 komên çete ku DAÎŞ, Cephet El Nûsra, Ehrar El Şam jî di nav de bûn, li Şehba, Minbic, Reqa, Girê Spî êrîş birin ser Kurdan û qala wê pêvajoyê kir: "DAÎŞ'ê dixwest Kurd û Ereban li ber hev rake û şer di navbera wan de derxîne. Hinek ketin vê xefikê. Lê belê gelê herêmê neket xefikê. Mesela, hem Ehrar Şam hem jî DAÎŞ'ê xwestin Kurdan ji Girê Spî derxînin. Kurdan wê wextê malên xwe emanetî gelê Ereb kirin. Piştre êrîş birin ser Kobanê. Armanc ji êrîşa li ser Kobanê jî ew bû ku şerekî di navbera Ereb û Kurdan de derxîne. Li Kobanê jî nekarîn vê bi ser bixînin. Ji xwe gef û êrîşên dewleta Tirk ên li ser Girê Spî dewama vê yekê ye. Dixwaze Ereb û Kurdan li ber hev rake, bike dijminê hev."

### EMÎRÊN DAÎŞ'Ê ROJANE DIÇÛN TIRKIYÊ

El Abid bi bîr xist ku di dema dagirkeriyê de emîrên DAÎŞ'ê rojane diçûn Tirkiyê û dihatin û got, "Cihê îstîxbaratê yê emîrên DAÎŞ'ê yên li Girê Spî, Tirkiye bû. Diçûn wê derê, bêhn vedidan û dihatin. Carekê mirovekî me dema ji bo çareserkirina pirsgirêkekê çû cem wezîfedarên DAÎŞ'ê ji wî re gotin, "Emîr li Tirkiyê ye, heta ku ew neyê em nikarin tiştekî bikin." Ev rewş ne tenê di dema DAÎŞ'ê de bi vî rengî bû. Di dema komên bi navê OSO' de jî di dema Cephet El Nûsra de jî fermandarên wan bi şevê diçûn Tirkiyê û li wir diman. Ji ber ku derî vekirî bû û ev bi eşkere dikirin."

### ERDOGAN JI DEMOKRASIYA ME DITIRSE

Hemîd El Abîd diyar kir, dewleta Tirk dixwaze DAÎŞ'ê rizgar bike lewma êrîşê dibe ser herêmên azad ên Rojava û Bakurê Sûriyê û got, "Tinebûna DAÎŞ'ê tê wê wateyê ku êdî neynûkên Erdogan li vê herêmê namînin. Ji ber vê yekê gefê li herêmê dixwe. Wê nema karibe ji vê herêmê bixwe. Ji hêzên demokratîk û rêxistinbûna demokratîk ku me li vir ava kirine, ditirse. Naxwaze li herêmê demokrasî hebe. Li Efrîn, Bab, Cerablûs û Ezazê ku ji aliyê dewleta Tirk ve hatiye dagirkriin, rojane komkujî, destavêtin û talan heye. Lê li herêmên me tiştekî wiha nîne. Erdogan ji aramî û demokrasiya li herêmên me ditirse û dixwaze gemara xwe li herêmên me jî belav bike."

### EM XWE BI XWE BI RÊ VE DIBIN

Hevserokê Meclîsa Rêveber a Kantona Girê Spî Hemîd El Abîd di dawiya axaftina xwe de bang li rojnamevanan kir ku bên Girê Spî û bi çavên xwe rewşê bibînin: "Li nava Girê Spî bigerin û bi çavên xwe bibînin bê me çiqas rê, dibistan û xizmet kirin. Tevî vê yekê tecrûbeyeke cuda ya rêveberiyê li vir heye. Girîng e her kes tecrûbeya li vir lêkolîn bike. Bêyî ku zexta serweran li ser me hebe, em xwe bi xwe bi rê ve dibin. Em hêvîdarin ku dewletên Rojhilata Navîn, hemû dewletên Ereb wê şêweyê me yê rêveberiyê ji xwe re bikin mînak û gelên herêmê xwe bi xwe bi rê ve bibin."



# Divê rewşa Ocalan li qada navnetewî bê vegotin



Wekîla Swîsreyê Laûrence Fehlmann Rîelle diyar kir ku Konseya Ewropa û CPT jî di tecrîdkirina Ocalan de berpirsyar in û got, "ji bo Ocalan divê tevgereke navneteweyî bê avakirin."

Wekîla Partiya Sosyalîst a li Parlamenta Neteweyî Laûrence Fehlmann Rîelle li ser binpêkirina mafên mirovan a li Tirkiyê, helwesta Ewropayê û tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan axivî.

### CPT BERPIRSYAR E

Rîelle rewşa Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan nirxand û got, "Rewşa Ocalan gelekî girîng e. Bi rengekî vekirî mafên mirovan ên Ocalan tên binpêkirin. Di çareseriya pirsgirêka Kurd de Ocalan aktorekî mezin û girîng e. Ocalan yek ji îmajên herî girîng ên PKK'ê ye. Bi kurtasî, Ocalan ji aliyê Kurdan ve weke lîder hatiye qebûlkirin. Bêdengiya li pêşberî binpêkirina mafên mirovan ên kesayetekî ewçend girîng, jinedîtî hatina vê yekê nayê qebûlkirin. Li gorî hiqûqa gerdûnî şert e ku Ocalan jî ji mafên hemû mehkûman sûdê werbigire. Hevdîtina Ocalan a bi malbatê û parêzeran mafekî herî bingehîn e. Nabe ku ev bê astengkirin. Hêz û parêzerên pêşverû divê li ser vê mijarê rawestin. Ji binpêkirina mafên mirovan ên Ocalan, Konseya Ewropa, Parlamenta Ewropa û Komîteya Pêşîgirtina li Êşkenceyê (CPT) jî berpirsyar in. Bêdengiya van saziyan ne ya fêhmkirinê ye."

### DIVÊ JI BO OCALAN TEVGEREKE NAVNETEWEYÎ WERE AVAKIRIN

Rîelle got, ji bo balê bikişîne ser şert û mercên Ocalan di nav de ye, pêwîste tevgereke navneteweyî ya ku gelek hêz tê de ne bê avakirin. Rîelle wiha dewam kir: "Bi beşdariya wekîlên ji Parlamenta Ewropayê, parlamentên welatên din, siyasetmedar û rewşenbîran, divê tevgereke berfireh were organîzekirin. Ev tevger divê bala medya navneteweyî jî bikişîne ser vê mijarê. Medya girîng e. Bi kurtasî divê rewşa Ocalan li qada navneteweyî bê vegotin.

Kêm maye ku dema Ocalan a mayina li girtîgehê bibe bi qasî dema girtîmayina Mandela. Ev ne demeke hêsan e. Eger mirov rola Ocalan a li nava gelê Kurd û binpêkirina mafên wî bînin ber çavên xwe, hingî gelekî girîng e ku li qada navneteweyî tevgerek jê re bê avakirin."…*ANF*

# Partiya Çep biryara DYE'yê şermezar kir

Partiya Çep a Kurd li Sûriyê destnîşan kir ku helwesta Amerîkayê li hemberî rayedarên PKK'ê ku têkoşîna azadiya gelê Kurd didin, cihê xemgînî û şermezariyê ye.

Buroya Siyasî ya Partiya Çep a Kurd li Sûriyê biryara Emerîkayê ya derbarê sê rêveberên PKK'ê Mûrad Karayiln, Cemîl Bayik û Dûran Kalkan de şermezar kir û bang li Amerîkayê kir ku helwesta xwe zelal bike, bi keysbaziya Tirkiyê neyê xapandin û rê li pêşiya destdirêjiyên Tirkiyê yên li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bigire.

Daxuyaniya Partiya Çepgir wiha ye:

"Ev demek e serokê Tirkiyê Recep Erdogan gefa êrîşa li dijî herêmên rojhilatê çemê Firatê dixwe û parastina sînorê başûrê Tirkiyê hincet digire û îdia dike ku Yekîneyên Parastina Gel (YPG) bi avakirina statuyeke kurdî gefan li ewlehiya neteweyî ya Tirkiyê dixwe. Di vê çarçoveyê de artêşa Tirk rêze êrîş li dijî gundewarên Kobanê û Girê Spî pêk anîn û di encamê de welatiyên sivîl ên Bakurê Sûriyê hedef digire. Piştî hevdîtina di navbera Tirkiye û Amerîkayê de dezgehên çapemeniyê ragihandin ku Amerîka xelateke pereyan ji kesên ku agahiyan derbarê cihê rayedarên PKK'ê û KCK'ê Murad Karayilan, Cemîl Bayîk û Duran Kalkan de bidin, veqetandiye.

Ev helwesta wê li hemberî van rayedarên PKK'ê cihê xemgînî û şermezariyê ye. Bi taybetî ji ber ku ev rayedar têkoşîna rizgariya gelê xwe didin û destdirêjî li tu aliyan nekirine.

Em wek Partiya Çep a Kurd li Sûriyê bang li Amerîkayê dikin ku bi erkên xwe ji bo tunekirina DAIŞ'ê rabe û herêmên Rojavayê Kurdistanê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê biparêze. Em bang li Amerîkayê dikin ku helwesta xwe zelal nîşan bide û bi keysbaziyên Tirkiyê neyê xapandin. Em helwesta Amerîkayê derbarê rayedarên Kurd Murad Karayilan, Cemîl Bayik û Duran Kalkan de şermezar dikin."

# Demildest dev ji êrîşên li ser Rojava berdin



Hevserokê Giştî yê HDP'ê Sezaî Temellî diyar kir ku beriya hilbijartina 24'ê Hezîranê her roj derdiketin û li dijî Qendîlê gef dixwarin û got: "Niha em ketin qonaxa pêvajoya hilbijartina herêmî dîsa heman gefan li dijî axa Bakurê Sûriyeyê dixwe."

Hevserokê Giştî yê Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Sezaî Temellî derbarê pêşketinên dawiyê de axivî û bal kişand ser nelirêtiyên qeyûman û got: "Li Efrînê çawa bi destê çeteyên OSO talana zeytûnan pêk tê û dest datînin ser her tiştî û ku Tirkiye jî difiroşe, heman tiştî qeyûm jî îro li vir dikin. Dest danîne ser mal û milkên gel û li gorî dilê xwe difiroşin. Lê bila baş dizanibin em ê wan şaredariyan hemûyan yek bi yek ji wan bistînin û wan ji wir biqewirînin."

### JI BO HILBIJARTINÊ ÊRÎŞÎ ROJAVA DIKE'

Temellî bal kişand ser topbarana li dijî hin gundên bajarên Rojava û got: "Ez bi bîra we bixînim. Beriya hilbijartina 24'ê Hezîranê her roj derdiketin û li dijî Qendîlê gef dixwarin. Armanca wî ew e 'qehremaniyê' biafirîne ku dengê xwe zêde bike. Niha em ketin qonaxa pêvajoya hilbijartina herêmî dîsa heman gefan li dijî axa Bakurê Sûriyeyê dixwe û dest bi topbaranê kiriye. Dixwaze xwe li ser nijadperestî û faşîzmê birêve bibe. Divê bi kurdan re aştî bê heyî kirin. Hem li hundir û hem li derve. Heta hûn vê rastiyê qebûl nekin hûn nikarin siyasetê bikin. Divê demildest dest ji êrîşên li dijî Rojava berdin."

Temellî bal kişand ser Yekîtiya Neteweyî ya Kurd û wiha got: "Yekîtiya Neteweyî ya Kurd mijarek gelek dereng jî maye. Heke kurdên li par parçeyan bi hev re neşêwirin û tabloyek giştî daneynin holê dê bazariya li dijî kurdan bi dawî nebe û pêşiya vê yekê neyê girtin."

Temellî bal kişand ser rewşa Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan jî û wiha dewam kir: "Heke hûn tecrîdê rakin hûn ê pêşiya Rojhilata Navîn vekin. Ev mesele ewqas hêsan û zelal e. Ji bilî vê heta hûn dixwazin gotinan bikin, lê gotinên beredayî ne. Lewre birêz Ocalan modelek nû pêşniyar dike. Dixwaze ji bo meseleya hebûnê çareserî bîne. Manîfestoya bi hev re jiyankirinê datîne holê. Ji ber vê yekê gelek bi qîmet e."

### XELATKIRIN ÇARESERIYÊ NAYNE ROJHILATA NAVÎN

Temellî biryara xelatê ya DYA'yê ku derbarê hin rêveberên PKK'ê de girt jî nirxand û wiha got: "Her hal vana Texas difikirin. Berê filîmên wisa hebûn. Ji bo mirov bên girtin xelat dikirin. Bêguman nêzîkatiyên bi vî awayî bi tu awayî çareseriyê nayne Rojhilata Navîn. Bi aliyek xwe jî komîk e. Yên Rojhilata Navîn anîn vê rewşê hêzên süper ên Rûsya, Çîn û DYA ye. Xerckirina şerê herî mezin a cîhanê dikin. Mirov êvarê dibihîzin ku xelatê danîne ji bo serê mirovan. Niha ev dişibe lîstîkek navîn."…*MA*



# Bi azadiya Ocalan wê şer bi dawî bibe

**Nerazîbûnên li dijî tecrîda li ser Rêber Ocalan zêde dibin. Welatiyên ji pêkhateyên Qamişlo yên Kurd, Ereb û Suryan tecrîda li ser Rêber Ocalan şermezar kirin û diyar kirin ku wê bi azadiya Rêber Apo şer û qeyrana li Rojhilatanavîn bi dawî bibe.**

Pêkhateyên Kurd, Ereb û Suryan ên li bajarê Qamişlo diyar kirin ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan rêberê hemû pêkhateyan e û heya azadiya Ocalan pêk neyê şerê li Rojhilata Navîn bi dawî nabe.

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan 20 sal e di nav tecrîdeke giran de tê hiştin. Dewleta Tirk nahêle malbat, parêzer bi Ocalan re hevdîtinê bikin û agahiyek jê nayê wergirtin.

Welatiyên bajarê Qamişlo ên Kurd, Ereb û Suryan tecrîda li ser Rêber Ocalan şermezar kirin û diyar kirin ku bi azadiya Rêberê Gelê Kurd qeyran û şerê li Rojhilata Navîn wê bi dawî bibe.



### GEL FIKRÊN OCALAN QEBÛL DIKIN

Ji pêkhatêya Kurd Ebû Suud Osman (48) tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar kir û wiha got: "Fikr û felsefeya Rêber Apo hemû pêkhatêyên Rojhilata Navîn hembêz dike. Pêkhateyên Rojhilata Navîn xwe li derdora fikrê rêber Apo perwerde dikin û bi felsefeya rêber Apo re hatine girêdan. Mixabin dewletên dagirker û neteweperest naxwazin fikrê rêber Apo belav bibe. Ji bo desthilatdarî û berjewendiyên xwe xeternak dibînin. Rêber Apo bi fizîkî hatiya girtin lê fikr û felsefeya wî di cîhanê de hatiya belavkirin. Azadiya fizîkî ya rêber Apo dê şerê Rojhilata Navîn bide sekinandin û qeyrana civakî jî bi dawî bike. Ji ber ku felsefeya rêber Apo li dijî desthilatdariyê ye û mafê mirovan diparêze. Azadiya hemû pêkhateyan Wê bi azadiya fizîkî ya rêber Apo pêk were."

### DIVÊ LI DIJÎ TECRÎDÊ DERKEVIN

Ji pêkhatêya Ereb Semîra Esxat Heydo (48) diyar kir ku jinên Ereb bi paradîgmaya Rêber Apo re şerê li dijî DAIŞ'ê dikin û wiha got: "Cihê şermezariyê ye ku hêzên navneteweyî li dijî tecrîdkirina rêber Apo dernakevin. Em hemû pêkhate azadiya wî ji xwe re esas digirin. Ji bo hemû pêkhateyan rêber Apo sembola azadiyê ye. Dewleta Tirk a dagirker bi tecrîda li dijî rêber Apo ji hemû pêkhateyan re peyama 'Hûn nikarin xwe bi rêxistin bikin' dide. Dema hilweşandina desthilatdariyê hatiye. Lê dijminên azadiya gelan bila zanibin ku êdî me sembola azadiyê nas kir û heya dawiyê jî di derdora sembola xwe de cih bigirin."

### OCALAN RÊBERÊ HEMÛ PÊKHATEYAN E

Ji pêkhatêya Suryan Ebû Enter Botos (58) jî têkildarî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ev tişt anî ziman: "Em pêkhatêya Suryan xwe li gorî felsefeya Rêber Apo perwerde û bi rêxistin dikin. Rêber Apo mafê karkeran û hemû pêkhateyan diparêze. Li dijî bindestî û yekperestiyê disekine. Rêber Apo rêhevalê hemû pêkhateyan ye. Yekitiya hemû pêkhateyan bi fikrê Rêber Apo xwe nîşan dike. Em gelên Suryan gelek caran hatine înkarkirin. Lê êdî em dibêjin ku rêberekî me jî heye ku em xwe li derdora wî dikin xelek."

Her wiha pêkhateyên Kurd, Ereb û Suryan bang li hêzên navneteweyî kirin ku êdî ji bêdengiyê derkevin û li dijî tecrîda li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bikevin nava tevgerê…*ANHA*

# 2 hezar 500 sivîl hatine revandin, çarenûsa 850 kesî ne diyar e




Leşkerên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wî kiryarên xwe yên dermirovî li Efrînê didomînin. Di rojên dawî de dest bi avakirina niştecihgehan kirine da ku malbatên çeteyên lê bi cih bikin.

Dewleta Tirk a dagirker piştî ku Efrîn dagirkir û şûnde bê navber kiryarên weke talan, revandin, kuştin, guhertina demografîk û hwd didomîne.

### REVANDIN

Ji destpêka dagirkerina Efrînê ve zêdeyî 2 hezar û 500 sivîl hatine revandin, di nav de 145 jin û zêdeyî 850 kes çarenûsa wan ne diyar e.

### GUHERTINA DEMOGRAFÎK

Artêşa Tirk a dagiker li gel kuştin û revandinê, polîtîkeyên guhertina demografiya Efrînê didomîne. Di vê çarçoveyê de welatiyên Efrînê didin koçberkirin û li şûna wan malbatên çeteyên ên ji Şam, Humis, Dera û hwd bi cih dike. Artêşa dagirker bi armanca ku malbatên çeteyan li kantonê mayinde bike, niştecihgeh û avahiyan ji bo wan ava dikin. Girêdayî mijarê "Meclisa herêmê" ya ku fermanên xwe ji MÎT'ê digire di vê heftiyê de daxuyaniyek derxist û avakirina avahî û niştecihgehan ragihandin. Armanca dagirkeran ji vê yekê ew e ku hebûna malbatên çeteyan li herêmê rewa û mayinde bike. Li ser vê yekê li herêmên çiyayî yên rojavayê gundê Mêremînê ya navçeya Şera dest bi avakirinê kirine.

### DIZÎ Û TALAN

Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê dizî û talankirina mal û milkên sivîlan didomînin bi taybet hilbirînên zeytûnan. Nahêlin welatî biçin nava zeviyên xwe. Hêzên dagirker bi armanca xirabkirina xwezaya Efrînê dar û zeviyan dibirrin. Li gorî çavkaniyên herêmî, çeteyan li gundên navçeyên Şera û Bilbilê, zeviyên di navbera gundê Naza û devera Keleha Nebî Horî de, deşta gundê Qizilpaş, Bilêlê, Alçiya, gundên li ser sînorê Ezazê bi dehhezar darên zeytûnan jê kirine.

Her wiha çeteyan hilbirînên zeytûnan ên li gundê Emara yê Mabatayê dizîne û zêdeyî 3 hezar û 500 dar li gundê Afraz û Golîka Gopik ê navçeyê desteser kirin.

Berhemên zeytûnan li gundê Telef, Keferzêtê yê navçeya Cindirêsê, gundê Marata, Coqê, Tor Tewîl ê navenda bajarê Efrînê dizîn û darên zeytûnan ên welatiyê bi navê Mustefa Şahîn ku beriya çend meha ji aliyê çeteyan ve li bajarê Efrînê hatibû kuştin, desteserkirin.

Çavkaniyekî diyar kir ku çete li nava zeviyên gundên Berbenê yê Racoyê, gundên Sêwiyê û Heyatê yê Mabatayê digeriyan da ku nas bikin bê ka şênî zeviyan berhev dikin an na. Dema yekî bibînin zeviyên wî desteser dikin…*ANHA*

# Li dijî qedexeya li ser PKK'ê çalakiyeke hevpar

Gelek sazî û parêzvanên mafên mirovan ên li Elmanyayê wê ji bo şermezarkirina qedexeya li ser PKK'ê, nîjadperestî û qanûna polîsan a ku hikumet dixwaze bîne, roja 1'ê Kanûnê li paytext Berlînê xwepêşandaneke hevpar li dar bixin.

26'ê Mijdara 1993'an di dema hikumeta Helmût Kohl de PKK li Elmanyayê hatibû qedexekirin. Qedexe dikeve sala 25'an. Di sala 25'an de ji bo bandor û xisara vê qedexeyê li milyonek Kurdên li Elmanyayê û li demokrasiya Elman dike bê bibîrxistin, konferans, çalakî û xwepêşandanên protestoyî tên organîzekirin.

Yek ji van xwepêşandanan jî roja 1'ê Kanûnê li paytext Berlînê tê lidarxistin. Ji bo vê çalakiya hevpar, gelek saziyên civaka sivîl, zanyar, akademîsyen, hiqûqnas, parlamenter, rojnamevan û parêzvanên mafên mirovan bang kirin. Meş û mîtîng wê bi dirûşma "Daxwaza azadiyê nabe ku were qedexekirin - têkoşîna hevpar li dijî qanûna polîsan, qedexeya li ser PKK'ê û li dijî nîjadperestiyê" pêk tê.

Di daxuyaniya hevpar de hate ragihandin, Elmanya û Tirkiye welatên sereke ne ku li dijî tevgerên azadiyê şer dikin. Hate bibîrxistin ku ji roja PKK hate qedexekirin û vir ve bi hezaran kes hatin darizandin, bi sedan kes hatin destgîrkirin, serdegirtin li mala bi dehan kesî hate kirin û ev bang hate kirin:




"Em ji hikumeta federal dixwazin ku qedexeya li ser PKK'ê tavilê rake. Ev siyaseta antî-demokratîk a li dijî tevgera azadiyê tê kirin, divê êdî biqede. Me gelek caran dît ku civaka li Elmanyayê jî qedexeya li ser PKK'ê qebûl nake. Hem dema Kobanê, hem di xwepêşandanên G20 de, hem jî di dema çalakiyên ji bo şermezarkirina qanûna polîsan de me dît ku PKK ji bo demokrasiyê, aştî û azadiyê têdikoşe.

Em dixwazin 1'ê Kanûnê dakevin qadan û li dijî hevkariya hikumeta Elman a bi rejîma dîktator a li Tirkeyê re peyameke xurt bidin."

Meşa girseyî wê 1'ê Kanûnê roja Şemiyê saet 12:00 li meydana Alexanderplatzê ji cihê Neptûnbrûnnenê dest pê bike û tê payin ku li gel alîgirên demokrasiyê komên femînîst û antî-faşîst jî tevlî bibin.



## Teror û Dewleta Tirk

Mihemed SEYDÎ

Gotineke pêşiyan ya ku dibêje " keçelo navê min li te û komê min li serê te" heye ku tam li dewleta Tirk û serokê wê Erdogan tê. Hemû axaftinên di mêtîng û kombûnên xwe de rayedarên Dewleta Tirk ku niha Faşîzma AKP-MHP'ê serkêşiya wê dike de peyva teror derbas nebe nabe, ew her li ser zimanê wan e. Di bin vî navî de êriş didin digrin û qetil dikin. Ev komkujiyên ku bi destê dewleta Tirk dibin jî bi desteke hêzên din jî pêk tê..

Ev 40 salin Tevgera Azadiya Kurdistanê û gelê kurd li dijî hêzên dagirker têdikoşe. Dagirkeran her şer, êriş, qirkirin , talankirin û xesipkirin li dijî gelê kurd pêkanîne. Di hemberî vê jî têkoşşîn di meaneya xwe ya pîroz de bi pêşengiya Tevgera Azadiyê heta roja îro didome.

DYA li ser navê Wezareta xwe ya derve berî çend rojan daxuyaniyeke sosret da û got ku kesên cihê 3 rêveberên PKK'ê (tevgera azadiya kurdistanê ) bizanin ew ê xelata pere bidin wan. Derheqê vê daxuyaniyê de bertekên kurdistaniyan li ber çavan bû. Gotin:" divê herkes cihê van rêveberên tevgera azadiyê bizanibe. Ew di dilê me de ne, ger dikarin bira bên ji dilê me derxin".

Dibêjin ku DYA daxuyaniyekî wiha ji bo ku dewleta Tirk hinekî razî bike daye. lê ew di esas de êrişeke li dijî kurdistaniyan ne. Ewqasî pîvan nemane ku niha daxuyaniyeke bi vî rengî ji bo tenê dilxweşkirin dewleta Tirk dide, lê qet bertekên gelekî ku ji bo azadiya xwe têdikoşe û her roj li qadane û şerê terorê dike li ber çavan nagre.

Gelo nizanin ku yên pêşî li komkujiya derheqê gelê Êzidî li Şengalê girt ev tevger (tevgera azadiyê) bû. Dîsa li başûrê kurdistanê rê li DAIŞ'ê girt û di berxwedana Kobanê de berê xwe dan çeperên şer û li wir li dijî Terora DAIŞ'ê ku rûyê dewleta Tirk e şer kirin..

Piştî wê jî dibêjin em YPG'ê teror nabînin. ew çi helweste, yanî dixwazin bi vê jî gelê kurd razî bikin?. Her kurdekî welatparêz û xwedî wijdan di heman demê de PKK'î ye. Yê îro van êrişên ku bi nav li dijî pkk'ê ne qebûl bike, wê sibê êrişên li dijî YPG'ê û gelê kurdî re jî dengê xwe neke.

Behse terorê dikin, ka em tenê çend bûyerên ku li kurdistanê di van salên dawî de qewimîne bibîra we bixin û binêrin teror çiye.

Ji Roboskiyê em destpêbikin, di 28'ê kanûna 2011'an de bombe barandin li ser xelkê vê herêmê. 35 Mirovên ku hatin qetilkirin, hemû sivîl bûn. Gelek ji wan bi temenê kêmî 18 salî bûn. Dîsa bi wêrankirina bajarên kurdisanê, Sûr, Cizîr, Şirnex , silopî û Nisêbînê û şewtandina kesên li wir di jêrzemînan de li ber çavên hemû dunyanê ne ji terorê hîn wêdetir be wê çi be.

Li dijî gelê bakurê sûriyê- rojavayê kurdistanê ya ku DYA û Koalisyona navdewletî xwe hevkarê wan dibîne û bi wan re tevdiger terora dewleta Tirk çima nayê dîtin. Hincetên bêdengiya wan çi ne? . Rojane li ser sînor xelkê herêmê tê gulebaran kirin û qetilkirin. Efrîn bi dehan balafiran hate bombebarankirin, dagirkirin û heta niha jî li wir teror tê meşandin. Ev jî hêzên navnetewî ji bêdengiya wan dernaxe, mirov dibêje qeyî ne li vê dunyayê ne.

Kuştina Saraya 7 salî ya ku berî 2 hefteyan li ser riya dibistana xwe bi destê skvanên Artêşa Tirk a dagirker hat kuştin ne teror be çiye.. Ji bo dilê dewleta Tirk xweşbikin êrişî gelê kurd dikin. Li fransa êrîşî çalakiyên ku ji bo azadiya Rêber Ocalan di 6'ê mijdarê de destpêkirin kirin.

Li Elmaniya ji bo dilê deweleta Tirk xweşbikin êrîşî siyasetvan, hunermend û saziyên gelê kurd dikin.

Lê ji bo rastiya dewleta Tirk ku pêşengiya Terorê dike nebêjin rola sê Meymonan dilîzîn, çav, guh û devê xwe digrin.

Ya ku ez dixwazim bibêjim ew e ku ger hun li terorê digerin ew li ber çavaye. Terora wan bi rûpoş û maskeya dewletê ye. Teror dewleta Tirke..